

Siyasetên çewt yên PKK rê dide Tirkîyê êrîşî deverên me bike

Kurdistan Ehmed Elî



Di vê dema dawî de gefên berpirsên Tirkîyê bo encamdana operasyonê li Tilrifet û Munbic li gundewarê Helebê zêde bûne, û vê yekê jî tirsek li cem welatiyan

dirust kiriye, welatiyan derbarê encamdana vê operasyona Tirkîyê û grûpên çekdar nerînên xwe anîne ziman. Welatiyek dibêje, çûna hêzên ser bi PYD ve ji bo Munbic û wan deveran

ji destpêkê de şaştîyê mezîna bû, 600 ciwanên Kurd li Munbic şehîd ketin, xwîna wan bê sût çû, gelo mîletê me çi sûtê ji Munbic û wan deveran dibîne. Welatiyek din jî dibêje,

PKK bûye bela bi ser serê Kurdên Kurdistana Sûriyê, gelo karê PKK li deverên me çi ne, ew cihê PKK lê heye, dê bibe armanca Tikriyê, Siyasetên çewt yên PKK rê dide Tirkîyê êrîşî deverên

me bike, bo zorê dihêlê welatî al û sempoîlên wan bilind bikin û ev hemû dibin hincet di destê Tirkîyê de, jibîlî vê yekê ev partî her roj rêkeftinê ligel aliyekî dirust dike.

ENKS 14ê Hezîranê nû dike



Dr. Munîb Ehmed

(Kurdistana Sûriyê) dikir, vê rêxistinê deng di nav gelê Kurdistana Sûriyê de veda, miletê Kurd xwe li dora partiya xwe da hev. Di rastiye de, damazrênerên Partiyê karekî bê hempa kirin, herwiha piştevaniya xebata gelê Kurd li perçeyên din yên Kurdistanê kirin.

Tê zanîn, hîlbijartinên 5ê Eylûla 1961ê piştî bidawîbûna yekîtiya Sûriyê û Misrê bûyereke cuda bû ku Dr. Nûredîn Zaza xwe ji bo Perlemana Sûriyê namzet kir, lê namzetbûna wî ji aliyê hikûmeta Sûriyê ya wê demê hat redkirin û piştê Dr. Nûredîn Zaza hat girtin. Di sala 1965an, de Partî bû sê perçe û ji wê demê ve perçebûn di nava partiyan de zede bû, heta sala 1990î, partiyan Kurdî bi yek listê di hîlbijartinan de beşdar bûn, û di encam de 6 Kurd derbasî Perlemana Sûriyê bûn,

Di 14ê Hezîrana 1957an de, hizr û bawerî peyda bû, mêrxasî û cengawerî kete warê praktîkê de, tekoşeran biryara damezirandina Partiya xwe dan (Partiya Demokrata Kurd li Sûriyê). Ev Partî yekem rêxistin bû li Sûriyê ku Demokrasi ji bo Sûriyê dixwest û daxwaza Sûriyeke dikir ku mafê hemû pekhatiyên tede parastî be, herwiha daxwaza mafên rewşa yên gelê Kurd (Siyasî, Civakî, kiltûrî) li deverên Kurdî




lê mixabin ev tişt tenê di yek gerê de li Perlemana Sûriyê çê bû, û ne hat dubarekirin. Di 2011an de, Şoreşa Sûriyê destpê kir, û gelê Kurd di nav Şoreşê de cih girt, û hêviyek li cem gelê Kurdî û Partiyên Kurdî çê bû, û Encumena Niştîmaniya Kurdî Li Sûriyê ENKS ku ji piraniya Partiyên Kurdî û kesên serbixwe pêk dihat hat damezirandin, ku te naskirin bi aliyekî Kurdî ku hêviyên gelê Kurd

li Kurdistana Sûriyê li ser wê ne, û gelê me jêre digot, Encumena Niştîmaniya Kurdî nûneratiya me dike. Encumena Kurdî ji hejmarek partî û dezgehên civaka sivil û kesayetiyên serbixwe pêk tê, ji aliyê siyasî û rêxistinî ve hevgirtî ye û karekî kêr jê re divê ku bibe Partiyek bi tenê, û ev daxwaza cadeya Kurdî ye, tenê pêwîstî bi karekî dilsoz û hinek qurbanî û danîna ber çavan nixrê

Netewî (Xak, Milet, Maf) heye. Ji ber vê yekê divê komîteyek taybet ji nav Encumena Kurdî pêk were, û kar li ser vê daxwazê bê kirin, ev gav divê bê kirin wekû wefadarî ji xwîna pakrewanên tevger û gelê Kurd re li Kurdistana Sûriyê, û wefadariyek ji Tekoşerên Tevgera Kurd re yên ku jiyana xwe ji bo vî gelî û mafê wan terxan kiribûn, herwiha ji bo roja 14ê Hezîranê ya pîroz.

10 pirs

bi boneya 65emîn damezirandina yekem partî



Idrîs Hiso

rêz bikim, hêvîdarim partiyan Kurdî û Kurdistanî li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê karibin rojekê çî dûr be çî nêzîk be bersiva van pirsan bidin?

1- Piştî 65 salan ev partî dikarin niha behsa çî encamê di biwarê Zimanê Kurdî de bikin, çend sazî hene, çend pirtûk belav kirine, çend rêbaz afirandine, heta çî radeyê vê pirsê girîng dibînin, çî kar û karnameyên wan hene?

2- Piştî 65 salan rola xort, ciwan, gencan di nav partiyan de çî ye? Van partiyan karibûn çend xortan perwede bikin, berpirsiyartiyên mezin bispêrin wan, sûdê ji tiwane û wizeya wan bikin di xizmeta pirsgrîk û berjewendiyên Kurdistan û Kurdistanîyan de?

3- Piştî 65 salan berê me

li kuderê ye, em çawa li paşeroja gelê xwe dinerin, cihê me li Sûriyê çî ye, aya van partiyan karibû li ser xaleyên girîng û bingehîn li hev bikin û li ser wî bingehî berê xwe bidin hêzên navdewletî, dost, heval û partiyan Kurdistanî?

4- Piştî 65 salan bername û nerîna we di biwarên tendurustî, abûrî, werişî, komelayetî, rewşenbîrî û avakirina kesayetiya Kurd li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê çî ye?

5- Piştî 65 salan pilana we ji bo Kurdên dervî welat, çî rewnda Kurdî li welatên Erebi, Ewropa yên Rojavayê Kurdistanê çî ye?

6- Piştî 65 salan ji damezirandinê û piştî bêhtir ji 10 saln ji kirîza Sûriyê, aya ti bihaneyek ji bilî ku em bêjin Rêveberiya Xweser nahêle em beşdarî desthilatê

bibin heye? Aya we lêvegereke riid kiriye bê çima ewqasî rewşa we xirab û aloz e?

7- Gelek partî dibêjin em jiberî 65 salan ve hatine damezirandin di heman rojê de? Heger wisaye çawa hûn partiyan ciywazin?

8- Pştî 65 salan ji damezirandinê, û deh salan ji kirîza Sûriyê ku sêçarîkên şer bi ragihandinê dibe, ragihandina we di çî astê de ye? Kî ne ew kesên ku ragihandina we -heger hebe- birêve dibe? Çawa û li ser çî binemayeyan tene neqandin an jî tene destnîşan kirin?

9- Bi vê boneyê ez dixwazim nasbikim we çî kiriye ku pêla penaberiye biweste, û ji aliyekî din ve penaber li malên xwe vegerin?

10- We çî heye ji me re

bêjin derbarê herêmên dagîrkerî Efrîn, Serêkaniyê û Girê Sipî û gundewarên wan? Bi vê boneyê ez pîrozbahiyê arasteyî her niştîmanperwerekî dikim, herwisa her kesê ku hîna bidisozî kar û xebata xwe dike. Min nexwest wek nerîtiyê di van boneyande bikim, behsa palewanî, destkeftî û serîmezinkirinê bikim, belam min xwest hin pirsan bikim ku hîna jî pirs mane ez dê ji xwêneran re bihêlim ku ew jî li van pirsan zêde bikin, bi omêda ku ev partî van pirsan bixwînin û piştî 65 saln be jî careke din li xwe vegerin li ser van pirsan vokolin û bikaribin bersiva xortekî dilêş bidin.

65 sal di ser damezirandina yekemîn partiya siyasî Kurdî li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê re derbas dibin. Di vê boneyê de hejmareke pirs xwe didin pêş, aya piştî derbasbûna ewqas sal bersiva wan pirsan çî dibe? Li vir ez dê çend pirsan

Revandina zarokan li taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê berdewam e

Kurdistan



Tevgera Ciwanên Şoreşger a ser bi Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD ve, 2 zarokên Kurd ên 9 û 10 salî li bajarê Helebê revandin.

Rêxistina Ciwanên Şoreşger 4ê Hezîranê li taxa Şêx Meqsûd a Helebê du birayên biçûk Ibrahîm û Mihemed Şewqî Yûsif bi armanca biçekkirina wan, revandin. Ibrahîm 9 salî û Mihemed 10 salî ye û ew her du ji Kurdên Efrînê ne û bi malbata xwe re li Helebê dimînin. Dema Mihemed û Ibrahîm ji kargeha cildirûtîne derketin û ber bi male ve diçûn, ji aliyê endamên Tevgera Ciwanên Şoreşger ve hatin revandin.

Taxa Şêx Meqsûd a Helebê, wek taxa Kurdan tê nasîn û di destê grûpên ser bi PYD de ye. Piştî kontrolkirina Efrînê ji aliyê artêşa Tirkîyê û grûpên çekdar ên ser bi wê ve, hejmarek mezin ji Kurdên Efrînê lê bi cih bûne.

Tevgera Ciwanên Şoreşger, rêxistinek ser bi PYD ve ye û berê gelek zarok û ciwanên Kurd li herêmên cuda yên Kurdî revandibûn û biçek kiribûn.

Malbatên zarokên revandî kiryarên Tevgera Ciwanên Şoreşger şermezar dikin û bang li rêxistinên ku girîngiyê didin mafên zarokan, rêxistinên navdewletî û aliyên pêwendîdar dikin ku fişarê li Rêveberiya Xweser û Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) bikin ta ku çarenivîsa zarokên wan diyar bikin.



Rejîma malbatî di çarçoveya rejîma dîfakto li Kurdistana Sûriyê

Sîpan Husên

Piştî 2011an li Sûriyê qerbalix û şoreş dijî rejîma sitemkar detspêkir, û pêra grûpên leşkerî serê xwe bilind kirin, ji grûpên ku xwe opozîsyon dîtin, û grûpên ku rejîmê avakirin, û ev grûp li gorî berjewndiyên rejîma Sûriyê, û grûpên opozîsyonî li pê berjewendiya welatên derva hatin bikaranîn, û bûne weke "proksî". Jiber ku ew grûp ne hatin ji bo berjewendiyên millet. Em dibînin bê çi xwelîserî bi serê millet anînin. Ji sistema tak alî ta birçîbûn û koçberî ta bi revandin û kuştinê. Van bûyeran hişt millet rejîmên malbatî ava

bikin . Pênasîna Rejîma malbatî: Ev rejîm tê avakirin dema ku rejîma heyî bi kar û erkê xwe ya beravanî, û xizmetguzariyê millet cibicî nake, millet di vê neçariyê bi erkê xwe wek rejîmekî cibicî dike. Serokwezîrê Berê yê Sûriyê Riyad Hicab dibêje "Di sal 2012an serok Sûriyê ferman da ku baregehên yên leşkerî radestî "PKK" bikin, jibo kontrolkirina cadeya Kudî, û bibin xencerek di laşê Tirkîyê de, li vêde em dikarin têbighên ku "PKK" we proksî hatiye bikarain û ne ji bo berjewendiyên millet hatin. Em dizane ku PYD bûyê sedema ku Encumena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKSê ne bûyê beşek ji desthilatê li Kurdistana Sûriyê, û xwe kirin desthilat bê ku

millet ew helbijêrin, û bi hêsankariyên rejîmê bûne desthilat. Li Kurdistana Sûriyê niha bûyê wek daristaneke bê semyan, zarok têne revandin ji bo bazirganî û firostina endamê laş. Bûyera nû li derbarê revandin jibo bazirganiya mirovan, li Qamişlo zarokek hat rizgarkirin ji aliyê xelkê û ne ji aliyê desthilata heyî. Ku em li vêde tèn liser gotina Rejîma malbatî, ku millet neçare xwe biparêze ji revandin û bazirganiya mirovan Revandin eşkere ji aliyê desthilata "PYD" ve jibo leşkeriya neçar. Ew jî bû sedema ku malbat biryara rizgarkirina zarokên xwe ji wê leşkeriya neçar bûne û wan didn riya koçeriyê. Revandina nehênî ku bûyê tirsek di nava millet

de, û nizanin kîjan demê wê zarokên wan wê bê revandin û bi zehmet nas bikin li kûye. Li niha xelk yek ser dizanin ku grûpa ya bi navê "ciwanê şoreşger" ew yê zarokan direvînin. Ji bo karbinhişê wan li gorî felsefa xwe ew fîrbikin. Li gorî raporta "toreya sûrî ya mavê mirova" ku li sala 2021an balvkirbû û amje bi 156 zarok hatin leşgerkiren Ji li aliy "HSD"ê ve. Ev bûyerin revandin ji bo vê mebste dihêle xelik biryarin didin ku zarokê xwe rizgabikin. Jiber hebûna dû rêjê xelik neçarkirin gi biryar bidin ku zarokêwan li kû bûxînin. Yan dibstanê bser "PYD" yan ji dibstanê liser rêjme. Li hemû welatan helbijatin tineye, bes li welatin ne aram he yê. Dizîn gi

bûyê mijare rûjevyê. û xelik neçarkiriyê gi bi xwe parstina mal û samanê xwe, û benda deshelate heyê nemîne. Nebûne pêşkeşkirna xizmetgozarî ji av û aletirî e. Nebûne avekirna binesaziyê. Xelik neçarkiriyê kubi xwe xizmetgozariya pêşkêşkin. Ji revandin zaroka jibo bazirganiya mirova, ta revandina eşkere û ne eşker, û ne yeklayêkîrn liser proseya xwindina. û ne pêşkeşkirna xizmetgozariyan, ji eltrîke û avê, û ne avakirna binesaziyê, wê millet neçrabike têbegihên ku ew li darstanê jiyandikin, û dive xwe birêve bibin, û wan neçarkirin ku ji xwera rejîma malbatî ava kirin.

Ferhadê Içmo stêrek di asoya helbesta Kurdî de

Kurdistan-Bidûvçûn

Helbestvan û nivîskarê Kurdê navdar Ferhadê Içmo di nava gelê xwe yê Kurdistana Sûrî de, û di dîroka helbesta Kurdî de jî cihê xwe girtibû, Lê mixabin zû koça dawî kir û çû ser dilovaniya XWEDÊ. Helbestvan Ferhadê Içmo, di 15ê çileyê sala 1960î de li bajarê Qamişlo li Kurdistana Sûrî hatiye ser rûyê cîhanê û roja 8ê Hezîranê de, çû ser dilovaniya Xwedê piştî nexweşiyek giran û dirêj. Xemgînî pir bi ser gelê xwe de anî, Ji ber ku kesayetê xwedî bandor bû. Li dibistanên bajarê Qamişlo xwendina xwe bi dawî aniye. Di sala 1984 an de bawernameya bakaloryos di endazyariya şaristaniyê de ji zaningeha Helebê wergirtiye. Berî helbestê dil ketiye muzîkê û di sala 1970î de dest bi lêdana tembûr û gîtar û cumbişê kiriye, Helbestvan Ferhad Içmo di sala 1978an de dest bi nivîsandina helbesta Kurdî kiriye, û piraniya hunermendên



kurd ên navdar bi dehan helbestên wî kiribûn stran ji rexê hin hunermendan mîna (Mihemed Şêxo, Beha Şêxo, Birûsk Şêxo, Adilê Hiznî, Xelîl xemgîn, Şeyda, Sefqan, Se'ed Ferso, Selah Osê û E'itîdal Isma'îl) wek hatiye diyarkirin heft berhemên wî yên helbestên kurdî hene, hin ji helbestên wî jî hatin wergerandin ji bo zimanê Erebbî. Gelek helebostên wî jî di Rojname û kovarên kurdî de hatine weşandin. Helbestvan Ferhad Içmo, ji aliyê gelek dezgeh û xelatên helbestvan û wêjevanên Kurd û festîvalên helbesta Kurdî hatibû xelatkirin. Mîna xelata wêjevan û helbestvanê Kurd Cegerxwîn di sala 2013an' de, û xelata nivîskar û wêjevanê Kurd Ebdurehman Alûcî di xelata yekem de. Helbestvan Ferhad

Içmo, yek ji kesên afrîner û nivîskarê wefedar e. Ji ber vê yekê koçkirina wî jî ziyaneke mezin ji wêje û helbesta Kurdî re bû û Stûnek ji Stûnê Wêjeya Kurdî li Kurdistana Sûriya kêm bû. Mihemed Ehmed derbarê Helbestvan Ferhadê Içmo dibêje, bi koça dawî ya wî helbestvanê zîrek ziyaneke mezin gihîştê helbesta Kurdî li Kurdistana Sûriyê, bi rastî kesên wek wî mirovî nayên dubarekirin û pêwîste rêz li huner û helbesta wî were girtin, helbestê wî xweş û nazik bûn li ser dilê mirov, heta bi helbestên wî yên zarokan cuda û bêhempa bûn. Beşîr Murad jî wiha dibêje, helbestên Ferhadê Içmo xweş bûn, û cihekî wan yê taybet li cem xwendevanan hebû, ez dikarim bêjim ku helbestên wî cêwaz bûn.



Pêşmerge

Li bin siya, sor guleke şermîn,
bilbilekî perîşan...
hêlîna xwe rakir.....,

li bin siya, dareke pir şîn,
cotkarekî dilovan....
xan'yê xwe avakir,.....

li bin siya, peyveke şêrîn,
helbestvanekî biyan....
helbesta xwe hûna,
û tevna xwe li bakir,.....

di bin siya..
pêşmergekî dil bi xwîn,
miletêkî bê xwedan...
Ala xwe hilda,
zozanê xwe rizgarkir,
û welatê xwe azadkir!...

Perwerdeya zarokan di civakê de

Kurdistan- Cemîl Elî

Perwerdeya zarokan yek ji wan bingehanên ku dikeve ser milê dayikê, û pêwîste dayik bi sebir be da ku bikaribe pirsgirêkên tene pêşiya ê di vî warî de çareser bike, herwiha çawaniya serderiya ligel kesayetiya zarok, û warê perwerdeya zarokan warekî berfireh e, û pêwîste giringiyeke zêde bi vî warî di nava civakê de were kirin. Perwerdeya zarokan roleke giring e ku malbat di nava civakê de pê radibin, ku her malbatek berpirs e di ber

xwedîkirina zarokên xwe de, lê mixabin hin malbat hene di perwerdeya zarokên xwe de piştî xwe bi siza û lêdanê girê didin, û ev yek şaştiyeke mezin e ku derheqê zarokan de tene kirin, û ev yek ne şeweyê dirust de di perwerdeya zarokan de. Giftûgoya bi zarok re gelek malbat nizanin, lê ev yek baştirîn şeweyê ku bandoreke erênî li zarokan dike, û di hêla ku ji hestên xwe yên şermokane derkevin di de, a axaftinê de, giringe ligel wan bi xavî derbarê tiştên ku li dibistan û mal

wan dilgiran dike, û dema we dît ev şeweyê bê sûde, mirov dikare çîrokan jê re bibêje derbarê ew zarokên tiştêkî li malbata xwe venaşêr in, ev yek dê bi hêla zarok bêhtir bi xavî, û dê tiştên di nava mejiyê xwe de vala bike. Gelek caran malbat li pêşiya malbatên din kêmaniyên zarokên xwe dibêjin, û ev yek şaştiyeke mezin e û divê bi her şeweyekî ev yek neyê kirin, ji ber bandorê li hestê wî dike û rastî fedî û şermê tê û li ser derûniya wî xerab e, û dibe ku kesayetiya wî lawaz be

dema ku mezin bibe, û dibe ku bi tenê bimîne û durrî derdora xwe be, ji ber vê nabe sivkatî bi zarokê were kirin li pêş

xelkê, û bi taybet li pêş kesûkar û xizim û hevalan. tenê gftûgo ligel tê kirin dema ti kes li cem we nebe.

